
Welat
80
01/04/2021
Çandî - Giştî - Serbixwe

# 123ê

## Saliya Rojnamegeriya Kurdî Pîroz Be




Welat

Welat
Hejmar
80
01 /04/ 2021

# PEYVA WELAT

## 123ê

## Saliya Rojnamegeriya Kurdî Pîroz Be

**Desteya sernivîs**

*Kovara* **WELAT**
Çandî- Giştî- Mehane

Welat
Çandî- Giştî- Mehane

*Sernivîser:*
**Aras Yûsiv**

*Desteya rêvebir:*
**Imran Yûsiv**

*Dizayner:*
**Hesen Berzencî**

**Têbînî**: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpirsê wê ye

*Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne*

**ji bo têkiliyê:**
welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

*Bi boneya 123î saliya rojnamegeriya kurdî, kovara Welat roja 22ê nîsanê li hemû rojnamegerên kurd, kesên ku di rojnamegeriya kurdî de kar dikin û li gelê kurd pîroz dike.*

*Bêguman derketina yekemîn rojnameya kurdî, rojnameya (Kurdistan) li paytexta Mesrê (Qahîrayê) di 22ê nîsana 1897an de rojeke pîroz û dîrokî bû.*

*Îro dema ku em vê rojê pîroz dikin, pêwîste ku em ked û xebata wî nifşê ku bingeha rojnamegeriya kurdî damezirandin bi bîr bînin û bejna xwe li ber wan biçemînin. Di serî de damezînerê rojnameya Kurdista mamosteyê mezin Miqdad Midhet Bedirxan, yê ku bi saya wî rojnameya kurdî derket ber ronahiyê. Piştre mamosteyê mezin Mîr Celadet Bedirxan xwediyê rojnameya Hawar û Ronahî ku bi saya wî hîm û stûnên rojnamegeriya kurdî hatin danîn, ji giyanên wan ên pak re hezar rêz û silav.*

*Eger em li rewşa rojnamegeriya kurdî ya îronî binerin, em ê bibînin ku gavine pir mezin û giranbuha hatine avêtin. Îro bi dehan rojname û kovar bi zimanê kurdî derdikevin, û gelek gotar û mijarên girîng di wan de tênê weşandin.*

*Ji hêla ziman ve pêşketineke berçav heye, û rojnamegeriya kurdî karekî baş ji bo pêşxistin û standerkirina zimanê kurdî dike, ev bi xwe cihê şanaziyê ye.*

*Ji hêla naverokê jî dewlemendî heye, hejmara kesên pispor û nivîseran jî zêde dibe , ev jî cihê dilrehetiyê ye.*

*Rojnamegeriya kurdî hin bi hin ji bin baskê partiyan derdikeve û ber bi pisporî û serxwebûnê ve diçe, ev jî rewşeke durist û saxlem e, û dikeve xizmeta avakirina rojnamegeriyeke azad ku bikaribe bi rola xwe ya normal rabe wekî desthilata çarem.*

*Ji hêla rojnameya pisporî ve jî, îro hin kovarên pisporî derdikevin, lê piraniya wan di warê wêjeyî de ne. Bêguman ev tenê têrê nake, pêdivî bi kovarên pispor di warên zanistî, hunerî, civakî, jinê û her wekî din de heye. divê ji bo vê yekê jî kar û xebat were kirin.*

*Çalak kirina rojnamegeriya elkitronî jî gerek e, divê guhdan bi malperan were kirin, da ku bi rengekî berfireh werin şopandin.*

*Bi giştî, rewşa rojnamegeriya kurdî ber bi başbûnê ve diçe, lê hêvî ji wilo mestir e, gelek kar û xebat gereke da ku rojnamegeriya kurdî bigihêje asta rojnamegeriya cîhanî.*

*Pêdivî bi dezgehên rojnamegerî ên mezin heye da ku bikaribin bi vî barî rabin û rojnamegeriya kurdî bigihînin asta rojnamegeriya cîhanî.* ■

تبنّى ثورة
adopt a revolution

# CENGA QADIŞ



Gulal Kasani

Cenga Qadiş ew şerê her giran ê di dîrokê de, ku di nav bera hêzên Şahê Misrî-Fer`ûnî Remsîsê Duyem û Hosiyan bi serkêşiya Mewatilî yê Duyem de çê bûye.

**Cugrafiya Qadişê**

Bajarê Qadiş ji aliyê Cugrafî ve dikeve parava Rojavayê çemê al`asî, başûrê Deryaya Humisê bi çend KM; li Sûriyayê.

Ew ceng di Pêncemîn sal ji hukumdariya şah Remsîsê Duyem, di sala 1274`a de BZ, roja 9`an ji Werza Şemo rû da ye.

**Makderên zaniyarên li ser ``Qadiş``**

Agahiyên ku hatine wergirtin ji 3`ê jêderan in

1-Dastana ``Qadiş`` ya ku bişaşî nav li wê hatibûye kirin bi Helbesta ``Bintawir`` a deng dabû, ji ber ku Bintawir bixwe ew ê belge nivîsandiye.

2-Belgeya fermî li ser pêgeha ``Qadiş``

3-Ew nîgar, kevalên teyibetî bi pêgehê yên ku Remsîs li ser dîwarên peristgehên xwe yên girseyî nivîsîbûn.

**Emedekariya leşkerî**

Di şerê Qadişê de Hosiyan derdora 50000 leşker û 3700 Pêşkêşkaneyên cengî bikar anîne, her wisa Remsîsê Mesrî jî ji 4 feyleqan pêk dihat: Amûn, Weri`, Betah û Setê, derdora 20000 leşker û 2000 Pêşkêşaneyên cengî bikar anîne.

Ji sedema ku Ixnaton bi şoreşeke oldarî rabûye, li misrê şerekî navxweyî dadaye, bandoreke yekser li ser bingeh, hêman û regezên dewleta misrî kiriye, hundirê dewleta misrî sist bûye ji ber evê çendê bandora rola misriyan li gelek herêman jî kêm kiriye, bi tayibet li herêma Asiyayê, ji ber ku Ixnaton berisva bangwaziya mîrxanên bajarokên Asiyayê nedide; wekî ku hatiye naskirin ji gotarên Emarina.

Piştî mirina Ixnaton û şikestina şoreşa wî ya oldarî ya ku dixwest limêj û perestin tenê bo xwedan be, cardî Fer`ûn Hor desthilatdariya Misrê bidest xist û serokatiya leşkerî jî ket destên Amûn de, lê paşî mirina Amûn, Remsîsê Yekem desthilatiya misrê bidest xist û cardî aramî li welatê xwe vegerand, paşî mirina Remsîsê Yekem, Sîtyê Yekem bi hilmetên leşkerî dijî Hosiyan rabûye û sedem ji wan hilmetan vegerandina herêmên ku li Şamê ji dest wan çûne û êrîşên Hosiyan birawistîne û di dawiyê de dikarî bûye ku bigihije ermanca xwe dema ku herdu aliyan li Qadiş gihan lihevkirinekê; hate naskirin bi peymana Qadiş.

**Çîroka Hilmeta(Şalaw)* Qadişê**

Di werza Buhara pêncan ji hukumdariya Remsîsê Duyem û tevî leşkerê xwe yê giran ji Keliha Saro ya sînorî derketine bi mebesta êrîşberdanê, piştî mehekê giheştiye ser tixûbê bajarê Qadişê nêzîkî çemê Al`asî, di wî şerî de weke me ameje bi wê kir herdu aliyan hijmareke mezin ji leşkerên xwe beşdarî kiribûn ta hinek ji dostên xwe jî beşdarî kiribûn mîna Mîrxanê Helebê Rêmîşarîna li kêleka Şahê Hosiyan.

**Cenga Giran**

Remsîsê Duyem tevî ertêşa xwe bi dirjahiya rojekê û li nêzîkî Qadişê konê xwe vegirtin, di wê demê de 2 ji koçeran wekî ji wan re dihate gotin ``Şaşo`` derbasî nava konê Remsîs bûne û piştî lêpirsînê, wan jî wisa gotine ku






xwedîgiravî ew ji ertêşa Hosiyan cûda bûne û reviyane û Şahê Hosiyan ji qada şer xwe dûrxistiye û niha giheştiye Helebê, lê ya rast ew bûye ew herdu koçer sîxurbûn ji bal şahê hosiyan hatibûn şandin, lê mixabin Remsîs bi wan bawerbûye û bi wan hatiye xapandin.

Û li ser van nûçeyên nerast û bê ku wan saloxan serast bike tevî feyleqê Amûn berê xwe daye bakur-rojava li ser bilndeyekê konê xwe vegertiye, ta ku ertêşa wî bi temamî bigihije, di bendemanê de maye; di wê hingê de ertêşa wî 2 leşkerên Hosiyan girtin ên ku karê wan ger û vekolîn bû, piştî lêpirsînê bersiv dan ku ertêşa Hosiyan hîn li derdora Qadişêye û di amedebaşiyê de ye, û hîn li wir bi cih kiriye, bi mebesta ku nişkavekê ji ertêşa Misrî re çê bike.



Di awiyê de hate xwiyakirin ku pîlana wan bicih bûye, ertêşa Hosiyan çemê Asî derbaskiribûn û Leqê Raa herifand û pêwendî di nav bera Leqên Remsîs de çê kir û bi vî awayî êrîşî Leqê Amûn jî kir û hejmareke mezin ji leşkerê wî kuştin, Remsîs jî di aliyê leşkerî de jîr bû û ji ber ev yekê jî di rêyeke teng re li derdora Hosiyan zîvirt û ertêşa Hosiyan tengav kir, bi tayibet danpêdan ji ertêşê re ji Amûr giheştin wan ji ber vê yekê neçar bûn ku dev ji çek û pêşkêşanê xwe berdin û bi avjeniyê çemê Asî re derbaskirin li hember Remsîsan xwe, ne girtin.

Di roja din de şerekî giran di nav bera Remsîsê Duyem û Hosiyan de rû daye ku di nivîsînê xwe de wisa gotiye, di wî şerî de cengeke mezin di nav bera herdu aliyan de çê bûye û ziyaneke mezin giheştiye herdu ertêşan.

**Peymana Qadiş**

Piştî şerekî giran di nav bera Her du aliyan de rû daye û bi hezaran ji hev kuştine ji neçarî giheştine peymanekê, ji ber ku li jîwariya Qadiş bûye nav lê hatiye girin bi paeymana Qadiş.


**Giringiya Peymanê**

**Di dîroka mirovahiyê de Yekem peymana Aştiyê di nav bera 2 aliyên şer û hevkuj de çê bûye; di nav bera Hosî û Misriyan de hatiye imzekirin, 1258 BZ 9(peymana Qadiş).**

Kopiyek ji peymana aştiyê di nav bera Fer`ûniyan û Hosiyan de li ser bloyeke ji heriyê li payetexta Hosiyan Hatoşa li Bakurê Turkiyayê hatiye dîtin û ew li mozexaneya Istembolê hatiye pêşengkirin, her wiha kopiyek ji peymana Qadiş belgekiriye li baregeha Netewên Yekbûyî ve hatiye hildan wekî ku hatiye zanîn ku kopiya Hosiyan li ser tabloyên heriyî ne, û ya Misriyan li ser pelên Burdî hatiye nivîsandin.

# KAWA NE HESINKAR E

## Beşa 3



Cindiyê Xizan

**Keye Xisro ne hesinkar bû:**

Piştî rêz û rûmetê ji her lêkolînvanî re Dema kesek di dîrok, û çanda miletekî de lêkolînê bike, pêwiste di zarê wî miletî de têgihiştîbe, ji bo zanibe gotinên wî miletî yên kevn û li gorî zarê wî şîrove bike, encex karibe bighê rastiya dîroka wî miletî.

Li gorî efsanenasan gotina Udud → Edad → Ê dad, wateya ferwer nîşan dide, di hin ferhengên kurdî de jî dadwer tê wateya Hakim, (bi Erebî :Hakim), lê dema gotina Udud –Hudud- Hedad- bi zarê Erebî Hedad (hesinkar) hatiye nivîsandin..

أدد ← أداد ← هدد ← هداد ← حداد

Tenê lêkolînvanên kurd gotinaحـداد wergerandine kirine Hesin kar, ne kirine Ê dad an yê hakim.

Heger em vegerin demên paş de, Xûriyan bi ferwerên xwe re ev gotin bi kar tanîn, wek (Nûr Edad) ferwerê Lolo bû.

ji hin ferwrên Aşûriyan re digotin Edad, wek :

Edad Nîrarî yê sêyemîn, û Edad Şemşî yê pêncemîn

Her wiha Edad li hin deveran xwedadê baran, birq, birûsk û tavan bû, li gorî dîtinên di sala 1979 an de, li "Tepe Fexarê" nêzî Tepe Helaf (Tel Helaf) li bajarê Waşokanî (Serê kaniyê) li bakurê Sûryê pûtek ji kevir yê Edad, hate dîtin, hinek rewiştên wî bi herdû zaran (Ekadî, û Aramî) bi nivîsandinekê hatibû neqişandin, ku Hudud – Edad serokê xwedawendabû, û ew ferwerê sîkano, û gozano bû, û xwedawendê xêr, û bêr û mêrg û avê bû ...

Di sala 1890 î de, li gundê Zincîrlê pûtekî pir mezin yê Edad hat dîtin, li gorî tê gotin padîşahê Zincîrlê Panamo"Binavo" ew î ew pût ava kiribû, û Binavo digot: (min hêz û desthilatdariya xwe ji cem xwedawend Edad aniye.(

Heta bi Aramiyan li sûrya hundurîn Edad wek xwedad ji xwe re didîtin

Dema em vegerin jiyana Key Xisro ...

-berî her tiştî em ê bibînin ku kurê mîrê Medya Ferwerê Dûz bû, îdî wê çima karê hisinkariyê bike.

-piştî bavê wî û kesên pê re tevde hatin kuştin, ew hîn zarokekî ne gihiştiye, an kawî ye, û hem jê re digotin yê kesad, an yê beden zalî.

-ji ber wek me di despêkê de got: sîstema ferwrî ya welatê Medya sîstema Umdeyî bû, û gotina Umde bi kurdî wateya Keye dide, ji ber wilo jê re digotin keyê kawî yê dad, an Kêy kesad yê dad, û di dawiyê de jê re digotin keye Xisro

**Keye Xisro û nuhroj:**

Piştî hezarê salan berî zayinê, dema mirov yekem car li hev vehewiya, û bû civak, di riya jina dayik re bû, ji ber ku hestên dayikê yekbûn, û civakbûnê çê dike, û wekhevî û rastiyê ava dike, û ji mêr bêtir bi raz, û rêdanên xuristê re, jiyan dike, îdî ji ber pir ji zarokên xwe hezdikir, zarokên xwe li xwe vedhewandin, û wan ji dest xwe bernedida, û civakek biçûk ji wan diafirand, ji lewra li xwe hay bû, hiş û ramanên xwe bi kar anîn, xwe naskir ku zindîwerekî ramanwere ne deware, îdî jiyana xwe ji jiyana dewaran cûda kir, û ji ber tiştê yekem ku mirov lê gerya, ol û ew tiştên ku ji kevin de

afirandiye, di heman demê de ji xwe pirsî çima jenbûye, û kê ew jenkiriye, hino hino li xwedadê xwe geriyaye, û zindîwerên mîna giyanwerî, Afirît, xwedadwend, pîrebok tev de bi giyan û rewişt didîtin, lê rewiştên wan di ser rewiştên mirovan re didîtin, û yekem tiştê ku bi ronahî û tava xwe di şevê de bala wî kişandiye heyv bû, û di demên dawî de navê Sin lê kiriye, dibe ku navê jin ji navê Sin hatibe an berovajî, ji ber heyv, û jin bi pir weş û rewiştan layî hevin, û heta nuha Merqeda Şêx Sin, û Şêx Simis, li cem Îzîdxanê li Şengalê heye, û di her salê de wan bi bîr tînin.

Lê Dema roka bi tîn û tav dît pir jê saw kir, û jê re bû oldar, û ji bo di jiyana xwe de dilinya bimîne, olgeh li ser zemînê ji xwedadê xwe re bi hinek wêne û rûresman ew bi bîrtanî.

Ev ayîn, û rewresmên olî di demên pêş de ne ji valahiyekê hatinin, ji ber ramanên olî Kelepûrên mirovan yên kevin, ji nuh ve û li gorî heledora çandî rist û daniye.

Ol ne ji ezmanan bariyanin, lê ji kûza geltorên mirovahiyê hatinin der, û bi her mijarên xwe, (Efsan, xewn û xeyal, ...) û her bobelatek xuristê dikirin ji karê hêzek nediyer, û ew bobelat wek çekê xwedad didîtin, ku pê mirovê gunehkar ceza bike ...

Ev guhertina mirovî di jiyanê de şoreşa yekmîn bû di dîroka mirovahiyê de, û yekem car di herêma Mêrga Botan de afirye, ji Tepe Mirêbit, li Bakurê Sûryê li ber pirê çemê Feratê destpêkiriye, û li çar hawêrî dunyayê belav bûye, û li her dever û heledorekê û li gor zanebûna xwe bi wî zarê ku her hinekan ji xwe re afirandiye nav li tişên heledora xwe kiriye, her wiha navê rokê li cem kurda Rok, û Xor bû, û li cem miletê Misir ya Feroonî di dema asoyê de vavê wê

(Ar ton) bû, û di dema hilatiyê de (Xor bîra) bû, di dema nîvro de (Rei an Roh) bû, û di dema ro ava de navê wê (Avom an ava) bû, û wek me got: mirovên pêşende çi tiştê ku di xuristê de heyî bi giyan didît, û hêzek ji bo heyîna wî tiştî di nava wî de didît, û Ji ber di gûmana wan de ku mirov hew rêz û rûmet daye xwedad rok ji lewra xwedad rok bi jor ketiye, û jiyana xwe li wir bi sermedî ristiye, û li gorî 12 diwazde demjimêrên royê bi pencên xwe re li gemiya xwe siwar dibe ji rohilat ber bi ro ava de disûrike, û diçe, û li her deverên zemînê digeriya, û li her deverekê jî demjimêrekê dimîne, dema ku diçû ava jî diket nava xêwên şevê, û nehêlên mirinê de, îdî miletên herêmên ji ber pir dilê wan li ser xwedadê wan Rok diêşiya, û ji tirsa liser xew nedikirin, û bi dengê qîreqîrê û hewarê, û girî li wan dibû sibeh, lê dema ku xwedad rok di 21 ê avdarê de– roja wekheviya ro, û şevê, serme û germê –ji nuh ve hildihat, û ew wek rojek nuh didîtin ji lewra navê wê bû Nuhroj, û her wiha bi şahî li xurstê ber pê de diçên, û wek zarokekî nuh çêbûyî ew pêşwaz dikirin, û dema digihişt nîvro ew wek xortekî gênc didîtin, û pir pê bi hêz dibûn, lê careke din li roava vedgeriya pîrekalekî, û di şevê de carek din dimir...

ji ber Keye Xisro di meha Avdara sala 612 an de, êrîş bir ser Nînewa paytexta Aşûriyan, û bidestxist, ji bo şahiya serkeftina xwe bide nîşandan, îdî roja 21 ê Avdarê roja nuhrojê kir sersalek ji bo miletê herêmê, bi taybet miletê kurd, ku ji hezarê salan de jê re sersal, û cejin û şahiyek dîrokiye ...

îdî gerek em baş nasbikin, ku cejna nuhrojê ji berî Keye Xisro de ye, lê ew î ev roj kiriye destpêka sersala kurdan, û tevaya miletê herêmê . ■

Bavê Metîn

Jêder:

*Gotara "Imperatoriya Medan" birêz maoste Ramiyar.*

*Kovara Hewar, hejmara 28, 15 Gulanê 1941ê, Celadet Alî Bedirxan*

*Pirtûkên Firas El Sweah, nivîskarek ji bajarê Humis-Sûrya.*

*Ferhenga jîn, Kurdî-Erebî, ya Daner Mihemed Cemîl Seyda.*

## FERHENGOK

| | |
|---|---|
| dotin | حلب |
| heyvan | خميرة |
| meyandin | تخمر |
| Parzûn kirin | تصفية |
| şîr | حليب |
| mast | لبن |
| nîvişk | زبدة |
| rûn | سمن |
| penêr | جبنة |
| firo | حليب بعد الولادة |
| qeymax | قشطة |
| bêrîvan | حلابة |
| çêr | مرعى |
| pez | مجموعة الغنم و الخراف و الكبش |
| beran | كبش |
| sewal | ماشية |
| kerî | قطيع |
| axur | حظيرة |
| şivan | راعي |
| berx | خاروف |



Şêwekara Kurd

# XUNAV SALIH:

**“ Ez dixwazim bandora şer û mirinê li wî mirovê wêranbûyî bidim xuyakirin, bi hêviya ku rojekê roniyeke mezin di tabloyên min de xuya bike “**



Hevpeyvîn: Imran Yûsiv

**Şêwekara kurd Xunav Salih, li bajarê Qamişlo yê rojavayê Kurdistanê ji dayîk bûye, li fakulteya hunerên bedew ya zanîngeha Şamê xwendiye, pisporî di wênekêşiya zeytî de wergirtiye û xwendina bilind di heman warî de jî temam kiriye. Gelek pêşangeh li hundir û derveyî welêt vekirine. Aniha li bajarê Qamişlo dijî.**

Her hunermendek, her afrînerek dema ku derbasî warê dahênan û hunerê dibe, çîrokeke wî ya taybet heye, derbarê wan destpêkan hûn çi dikarin ji me re bibêjin?

**Ji biçûkaniya min de, berî ku ez derbasî dibistanê bibim, behreya nîgarkêşiyê û hezkirina wê li bal min hebû, her dem min ji nîgaş û xeyala xwe wêne û nîgar çêdikirin.. min hest pê dikir ku tiştek di hundirê min de heye, û wê rojekê ji rojan derkeve, min pir tişt xêz dikirin, û min gelek pirs jî ji xwe dikirin, gelo çima ez nîgarkêşiyê dikim, vê dawiyê min bersiva wan pirsan nas kir. Yekemîn tablo min çêkir, ez hîn xwedekara qonaxa navendî bûm, wê hingê min tabloyek bi rengê zeytî çêkir, mijara wê li ser komkujiya Helbçe bû, min ji ber wêneyekî kişand, û bi rastî min pir ji wê tabloyê hez kir, di heman demê de bavê min carcaran ji min re pirtûkên girêdayî hunera wênekêşiyê dianîn û min ew dixwendin, û min hin şêwekar û hunermend jî dişopandin, û li teknîka û şêwazê karê wan temaşe dikir, û bi piranî min karê wênekêşiyê dikir.**

**Pişt re min berê xwe da fakulteya hunerên bedew li zanîngeha Şamê, ew ji bo min mîna xewnekê bû. gava ez tê te hatim qebûlkirin wekî ku ew xewna min pêk hat. Di destpêkê de min digot: wê gelek xwendekarên xurt û behremend lê fakulteyê hebin, ev yek ji bo min wekî pozberiyekî bû, lê dema ez derbas bûm min ew pozberiya wilo xurt li pêşberî xwe nedît.**

**Di sala pêşî de min hinek zehmetî ditin, ji ber ez nû çûbûm Şamê û jiyana li wir ji**







**ez li ser wê xetê meşiyam û min ew li pêş xist. Di qonaxa pêşî de min dîmenên sirûştê çêdikirin, weke dîmenên li gundan û malên wan, tu dikarî bibêjî ku di destpêkê de min gelek dibistanên hunerî bi kar anîn da ku ez bizanibim ka kîjan ji wan nêzîkî min e, di destpêkê de min ji şêwazê derbirrîndarî (te'bîriyetê) hez dikir, ev berî ku ez kar bikim, lê piştî ku min kar kir û gelek dibistan taqî kirin, min dît ku şêwazê razberkirinê (tecrîdê) nêzîkî min e. piştî projeya derçûnê bi sê mehan derfetek ji min re peyda bû ku ez tabloyên xwe li Libnanê pêşkêş bikim.**

Di hin tabloyên we de, bala min kişand ku we rengê reş û spî tê de bi kar aniye, lê tevî wilo jî mirov pê hes dike ku gelek reng di hundirê wan de hene, tu çi dikarî li ser wan tabloyan ji me re bibêjî.

**Ez hez dikim, ew tiştê ku ez wan nîgar dikim weke ku ew di sirûştê de hene, her weha di tabloyê de jî wilo bin. Wekî ku di jiyanê de xweşî û nexweşî heye, her weha ev yek di hundirê tabloyê de jî diyar dibe, dema ku şêwekar cîwariya xwe derdibirrîne. Lê her rengek di cihê xwe de tê bi kar anîn.**

We behsa bîranîna dîtî kir, gelo ew jîngeha ku hûn lê mezin bûne, çuqasî cihê xwe di tabloyên we de girtiye ?

**Ev di hundirê her hunermendekî de heye, ji bilî wê jî ew tiştê ku hunermend bi çavên xwe dibîne û di xeyala xwe de tomar dike. Ev hemû dibin dewlemediyek ku hunermend**

**bo min tiştekî nû û biyan bû. gava min li tabloyên xwendekarên berî xwe dinerî û min didît ku bi qelema resas kar dikin, min ji wê şêwazê hez nedikir û min dixwest ez bi rengan kar bikim. 5 Beş di xwendina fakulteyê de hebûn, lê min beşê wênekêşiya zeytî bijart, çimkî min ji rengên zeytî hez dikir. Gava doktorekî me çav li şêwazê karê min ket, pir pê kêfxweş bû û ji min re got: Eger tu bi vî awayî kar bikî, ez ê pileya herî bilind bidime te. ev gotina wî ji bo min handaneke mezin bû. dema ez ketim sala sêyem ji xwendinê, min xwest weke keçeke Kurd li wê fakulteyê xwe ji wan re bidim xuya kirin ku ez dikarim di karê xwe de li pêş bim. Û bi vî awayî ez li ser hevalên xwe yekemîn derketim.**

**Di wê demê de xeyala min ji dîmenên jîngeha ku ez lê mezin bûbûm dagirtî bû, ew jîngeha kurdewarî ku min dixwest di tabloyên xwe de derbirrînim, her weha ez bi dîmenên Şamê jî bandor bûm, bi taybetî dîmenên êvarê û dema ku ro diçe ava, dîmenên ronahî û tarîbûnê, pencere, dîmenên dûr, av û baran, dema ku ronahî dikeve nav avê de, dema barîna baranê, dîmenên bi vî awayî pir min dikişandin û min ji wan hez kir.**

-Wekî ku we anî ser ziman, qonaxa xwendina li fakulteya hunerên bedew pir bandor li we kiriye .. pirsa min ew e; kengî em dikarin bibêjin ku kesayetiya Xunav ya hunerî û şêwazê wê yê wênekêşî û şêwekarî hate xuyakirin û ava bû weke hunermendeke xwedî taybetmendiyeke ciyawaz.

**Ez dikarim bibêjim ku ew şêwaz û kesayetiya min a hunerî di projeya derçûna ji fakulteya huneran de hate xuyakirin, wê hingê min rêya xwe ya hunerî nas kir, û min dît ku ew ya rast e.**





**bikaribe berdewam kar bike û biafirîne.**

Gelo rewşa şer û ev krîza berdewam ku bi salan dirêj kiriye, çendî bandor li karê hunermend kiriye, û çi cudahî di navbera karê we ya berî vê rewşê û karê we yê piştî wê de heye ?

**Piştî qonaxa ku min tê de sirûşt nîgar dikir, di salên dawî de min berê xwe da nîgarkirina mirov. Mebesta min ne mirov bi reng û şêwazê xwe yê derveyî ye, lê min xwest ez kûrahiya mirov, û tiştê di hundirê wî de derbirrînim. Lewra kesê ku li tabloya min temaşe bike, wê xwe li hemberî çîrokekê yan romanekê bibîne, û bi vî awayî wê bixwîne. Ji ber mirov û tablo yek in. min li ser vê xalê kar kir. Ez li ser wî mirovê wêranbûyî kar dikim, da ku rojekê ji rojan were avakirin. Ez dixwazim bandora şer û mirinê li wî mirovê wêranbûyî bidim xuyakirin, bi hêviya ku rojekê roniyeke mezin di tabloyên min de xuya bike.. tu dizanî aniha roniyeke biçûk di wan de heye, lê hîn mezin nebûye.**

Di vê krîza bedewam de, gelek hunermend ji welat derketin û berê xwe dan welatine din û li wir bi cih bûn, û hin jî ji wan li vir man, hûn weke şêwekareke kurd ku li welat mayî, vê yekê çawa dibînin, û gelo ev yek çuqas bandorê li karê hunermend dike ?

**Hunermend li ku derê be divê karê xwe berdewam bike, bêguman rewş li derve ne wek rewşa li hundirê welat e.. bi taybetî rewşa aborî .. aniha ez li mal kar dikim, min dixwest mersemek min heba ku min bikarîba zêdetir lê kar bikira, bêguman wê baştir ba.. lê tevî wilo jî divê kesê hunermend berdewam kar bike.**

Hûn weke jin, çi taybetmendîyê di hunera jinê de dibînin, û we çi zehmetî ji vî alî de dîtine ?

**Carekê yekî hunermend ji min re got; Gava min tabloya te dît min nizanîbû ku ev tablo ya hunermendeke jin e. ez bi vê gotina wî kêfxweş bûm. Hin kes hene dibêjin divê lawaziya jinê di tabloyên wê de xuya bike, ez ne bi vê gotinê re me û naxwazim kesek vê yekê di tabloyên min de bibîne.**

Xunav weke şêwekar û hunermend, ta çi radeyê li derveyî welêt hatiye naskirin, derbarê têkiliyên we bi şêwekar û hunermendan re tu çi dikarî ji me re bibêjî ?

**Ji vî alî ve lawazî heye, min gelek pêşangeh li derve venekirine, tenê li Siwêsrayê ez beşdaî pêşengehekê bûme, ew jî pêşangeheke komelî bû û gelek şêwekar tê de beşdar bûbûn. Ez dixwazim pêşangeheke taybet li derve vekim, da ku ez bigihêjim cîhaniyê û tabloyên min li derve bêne naskirin, ev ji bo min weke pozberiyekê ye.**

Çi astengî hene ku ta niha hûn nikarin karê xwe bigihînin warê cîhaniyê ?

**Ev yek jêhatîbûn û têkiliyên fireh jê re gerek in, her weha rewşa nexweşiya koronayê nabe alîkar ku ez bikaribim pêşangehekê li derve vekim.**

Di dema niha de, çi projeyên we yên hunerî hene, û ji bo pêşerojê we çi plan kiriye?

**Aniha ez dixwazim çend pêşangehan li vir vekim, li Qamişlo, Amûdê û deverên dîtir.. ji bo siberojê projeyek min heye ku ez li ser kultorê kurdî kar bikim, ev bi xwe projeyeke mezin e, gelek lêkolîn û dem jê re gerek e, ez bi hêvî me ku ez bikaribim tiştekî xweşik di vî warî de pêşkêş bikim.**

Gotina we ya dawî ?

**Ez dibêjim gerek hunermendên me yên li derveyî welêt alîkariya me bikin, netenê hunermend lê kesên me ên li derve jî, gerek alîkariya me bikin ku em bikaribin pêşangehan li wir vekin û hunera xwe pêşkêşî cîhanê bikin. û ji hunermendên me yên li hundirê welat jî dixwazim ku komcivînekê taybet bi hunermend û şêwekaran ava bikin ku em bikaribin hunera şêwekariyê li devera xwe li pêş bixin û çanda çêjeya hunerê di civaka xwe de belav bikin. Di heman demê de em ji kesên berpirs dixwazin ku alîkariya hunermendan bikin û guhdanê bi wan bikin.**



# PÊŞEWA QAZÎ MIHEMED (1893-1947)

Yek ji mizintirîn û gewretirîn rêber û serkirdeyên kurd di dîroka nûjen de ye. duyemîn rêberê kurd bû ku dewletek kurdî ragihand, piştî komara Araratê.

Qazî Mihemed li bajarê Mehabadê yê rojhilatê Kurdistanê ku nêzî sînorê navbera Îran û dewleta Sovyêt ya berê dikeve, di sala 1893an de ji dayik bûye.

Di nav malbateke dewlemend de mezin dibe. Pir guhdan bi zanist, şerîet û feqîtiya islamî dikir.

Ji bilî zimanê wî yê kurdî, bi zimanên erebî, tirkî, farisî, ferensî, ingilîzî û rûsî dizanîbû.

Dema ku yekemîn dibistan li bajarê Mehabadê hate vekirin, Qazî Mihemed weke berpirsekî çandeyî hatibû erkdarkirin. Wê hingê han bi xelkê dida ji bo ku fêrî zanist û huneran bibin, ta ku bikaribin li hemberî çewisandina ku li dijî gelê kurd dihate kirin rawestin.

Li dijî êlîtiyê û eşîrtiyê rabû, û bi dilnizmîya xwe û alîkariya belengazan hatibû naskirin.

Bi kesayetiya xwe bandor li hemû katên civaka kurdî dikir.


Bi hizir û ramanên demoqrasî û netewî bandor bûbû, û di destpêkê de tevlî Komela Xweybûnê ya ku di sala 1927an de hatibû damezirandin bû.

Di sala 1942an de komela Vejîna Kurdistanê hate damezirandin, û giraniya çalakiyên wê li Mehabadê bû. di sala 1945an de navê vê komelê bû Partîya Demoqrat a Kurdistanî, bi serkirdayetiya Qazî Mihemed.

Vê partiyê di bernameya xwe de doza pêkanîna azadiyê li Îranê, xweseriyê li Kurdistanê di çarçoveya sînorên Îranê de, û biratiya bi gelê azerî, farisî û hemû netewên din re dikir.

Ev partî di nav gelê kurd de bi xurtî belav bû, û dikarîbû bibe partiyeke cemawerî û hemû katên gel di hundirê xwe de civandin.

Dema ku desthilatdarî li Îranê lawaz bû, û artêşa sovyêt derbasî xaka Îranê bû, Qazî Mihemed dît ku ev derfeteke



zêrîn e, lewra di 22- 1946an de komara Mehabadê bi navê Komara Kurdistanê ya Demoqrat ragihand, û Qazî Mihemed wekî serokê komarê hate hilbijartin.

Qazî Mihemed kesayeteke xebatkar, netewperwer, û dilsozê doza gelê xwe bû, lewra gelê kurd jê hez kir û navê Pêşewa lê kir.

Xwest ku bi hekûmeta Tehranê re danûstandinê bike da ku têkiliya di navbera komara Mehabadê wekî desthilatdariyeke xweser ji kurdistanê re û hikûmeta navendî de bide destnîşankirin. Lê hikûmeta Tehranê ev xwestek red kir.

Di meha 1946an de, piştî vekişîna artêşa sovyêt, hikûmeta Tehranê hilmeteke leşkerî şand Kurdistanê, û dikarîbû komara Mehabadê têk bibe.

Gava artêşa îranî gihişte Mehabadê, serdarê artêşê Hemayonî serkirdeyên partîya Demoqrat a Kurdistanî li şaredariya bajêr civandin, û ji wan xwest wan çekên ku artêşa sovyêt dabûn wan radest bikin. wê gavê bersiva wan ew bû ku hemû teving li şervanan hatine belavkirin û lîsteya navan hatiye şewitandin, Qazî Mihemed berpirsyartiya vî karî rakir ser milê xwe . lewra ew li gel serkirdeyên partiyê ku hejmara wan gihişt 28 endaman hatin girtin.

Di dadgeheke leşkerî de, hukmê sîdarkirinê li Qazî Mihemed hate birîn, û di 31ê adara 1947an de, li qada Çarçira ya Mehabadê hate sîdarkirin.




# بدايات الصحافة الكردية

**عمران يوسف**

الصحافة نشاط اجتماعي خلاق تشكل الدافع الأساسي للارتقاء و التطور في أي مجتمع, و في المجتمعات الديمقراطية تعتبر الصحافة بمثابة سلطة رابعة حيث يتجسد عملها في ممارسة الرقابة على السلطات و مؤسسات الحكم المختلفة.

تنبع أهمية الصحافة في حياة الشعوب من خلال الدور الذي تقوم به في خدمة القضايا العادلة للشعوب و نشر الوعي و الثقافة بين الناس و التعبير عن عذاباتهم و آلامهم و معاناتهم و آمالهم, لاسيما الشعوب المضطهدة التي تناضل من أجل رفع الظلم الواقع عليها و نيل حقوقها المشروعة. و بذلك فالصحافة منبر نضالي فاعل و بالغ التأثير حيث قال عنها نابليون : «جريدة واحدة هي أكثر تأثيرا و فاعلية من جيش قوامه مائة ألف جندي»

عرف الانسان الصحافة منذ فجر التاريخ, ففي مصر القديمة و في عهد الفراعنة صدرت صحف مثل صحيفة «بابيروس» و ظهر الى جانبها نشرة معارضة. كما أصدر الرومان القدماء أيضا صحفا مثل «آكتا سيناتوس» و كانت الأخبار تكتب على لوحات خشبية بالجبس و تعلق في أماكن بارزة.

بعد اختراع المطبعة بأكثر من قرن و نصف, تم استخدام تقنية الطباعة من أجل نسخ الصحافة الدورية, و ظهرت الصحف المطبوعة في بداية القرن السابع عشر في ألمانيا عام ١٦٠٩ . و تعتبر البرجوازية أول من استخدمت تقنية الطباعة من أجل اصدار الصحف و نشرها ابتغاء للربح, لذلك سميت الجريدة «جازيت» نسبة الى عملة فينسكية تحمل نفس الاسم. ثم ظهرت الصحافة و انتشرت تباعا في أوربا, في انكلترا عام ١٦٢٢ ثم في فرنسا عام ١٦٣١ .

أما في الشرق فقد ظهرت الصحافة في وقت متأخر مقارنة مع الغرب, و ترافق ظهور الصحافة في الشرق مع موجة اليقظة القومية التي بدأت نهاية القرن التاسع عشر.

أسوة بشعوب المنطقة, عرف الشعب الكردي الصحافة في نهاية القرن التاسع عشر, و تزامن تطور الحركة القومية التحررية الكردية مع ظهور الصحافة الكردية الدورية. حيث كانت المنظمات القومية و الاجتماعية و السياسية و الثقافية التي أسسها المثقفون الكرد و التي كان هدفها النضال من أجل تحرير كردستان, كانت هذه المنظمات تقوم بدور اعلامي هام من خلال الربط بين قضية الاستقلال السياسي لكردستان و مسألة دراسة تاريخ و ثقافة الشعب الكردي و أدبه و فلكلوره. كانت تلك المنظمات تدرك أن الوثائق و الاصدارات الأدبية الكردية تلعب دورا رئيسيا في تنمية الشعور القومي و تعكس تراث و تاريخ الشعب. فنشرت القصائد الشعرية التي يغنيها الشعب و بيوغرافيا موجزة عن قادة الأكراد المشهورين و مقالات حول اللغة الكردية و ضرورة توحيد الأبجدية, ثم ظهرت مقالات أخرى ذات منهج وطني تبرهن على أن الشعب الكردي شعب يمتاز بشخصية مميزة و مستقلة و يملك تاريخا و أدبا و لغة و ثقافة خاصة.

كانت ولادة أول جريدة كردية في العاصمة المصرية القاهرة عام ١٨٩٨ و تحمل اسم كردستان. لم تكن ثمة منظمات اجتماعية و سياسية كردية كبيرة بعد, بل برزت مجموعات صغيرة و متفرقة من المثقفين الكرد حاملين لواء الوعي القومي, فأصبحت جريدة كردستان منبرا لأولئك المثقفين الذين أطلقوا من خلالها نداء اليقظة القومية. و كان للمثقف الكردي المعروف مقداد مدحت بدرخان اليد البيضاء في تحرير جريدة كردستان و تولى اصدارها من بعده شقيقه عبد الرحمن... بسبب الظروف السياسية آنذاك و الضغوطات المستمرة من قبل السلطات العثمانية المعادية للكرد, اضطرت الجريدة لتغيير مركز صدورها مرات عديدة, فطبعت حينا في جينيف ثم في فولكستون و لندن و في اسطنبول على يد ثريا بدرخان. و أثناء الحرب العالمية الأولى انتقلت الى القاهرة من جديد لتصبح نصف شهرية. و استمرت الجريدة في الصدور حتى ١٤ نيسان ١٩٠٢ حيث بلغ مجموع أعدادها ٣١ عددا. و تم اعتماد يوم صدور جريدة كردستان أي يوم ٢٢ نيسان عيدا للصحافة الكردية لدى جميع الكرد.

واجهت جريدة كردستان صعوبات و تحديات كبيرة, فالمحررون لم يتمتعوا بالحرية الكاملة في كتاباتهم, كما أن الرقابة التي مارستها السلطة العثمانية الحاكمة حينذاك كانت تشكل عائقا كبيرا أمام تطورها بما يخدم تغذية الوعي القومي الكردي و انمائه. و ادراكا منهم بأهمية الصحافة و دورها فقد بذل المثقفون الكرد قصارى جهدهم للاستمرار في اصدار الجرائد و المجلات الكردية رغم كل التحديات فأصدروا جرائد و مجلات عدة مثل «كورد» ١٩٠٧ , «روزا كورد» شمس الكرد ١٩١١ و التي أصدرتها جمعية هيوا في اسطنبول وأصدرها عبد الكريم أفندي




وهو من أهالي السليمانية، ولقد تغير اسمها وصار (هتاوي كرد – شمس الكرد , "بانكي كردستان" نداء كردستان 1913 و صحف أخرى.

بعد اتفاقية سايكس بيكو عام ١٩١٦ و التي تم من خلالها تقسيم كردستان الى أربعة أجزاء و تم الحاق كل جزء بدولة. ظهرت ظروف سياسية جديدة حيث أصبحت الصحافة الكردية الدورية ممنوعة في تركيا, أما في ايران فلم تكد تكون موجودة باستثناء الصحافة التابعة للأحزاب و التجمعات الكردية في مهاباد و التي كانت تصدر بشكل سري. و عندما نشطت الحركة القومية الكردية في مهاباد ظهرت الصحافة الكردية في ايران ثانية و ذلك خلال الحرب العالمية الثانية, حيث صدرت في كردستان الملحقة بايران بعض المجلات و الجرائد الكردية, منها المجلة الشهرية "نيشتمان" الوطن التي صدرت باللغة الكردية في مهاباد , صدر العدد الأول منها في حزيران ١٩٤٣ و الأخير في ايلول ١٩٤٦ حيث كانت لسان حال الحزب الكردي لبعث الكرد. في ٢١ آذار ١٩٤٦ بدأ صدور مجلة «خالالا» الوردة و كانت لسان حال رابطة الشبيبة الكردستانية في مدينة بوكان و دامت حتى شهر حزيران من نفس العام. كما صدرت في نفس التاريخ في مهاباد مجلة «هاواري نشتمان» صرخة الوطن, اضافة الى مجلة «غروغالي مندال» تربية الأطفال و التي رأت النور في العام ذاته و استمر صدورها طوال فترة جمهورية مهاباد الكردية.

أما في العراق فقد خضعت الصحافة الكردية للمد و الجزر تبعا للظروف السياسية السائدة, فكانت تصدر بصورة متواترة و غير منتظمة, و غالبا ما كانت تتوقف عن الصدور جراء مراقبة و ملاحقة السلطات العراقية الحاكمة لها و لمصدريها.

كان لصدور المجلات و الجرائد الكردية منذ بداية القرن العشرين بحروف مختلفة الأثر الأكبر على انتشارها في نطاق ضيق من أجزاء كردستان الأخرى, فحتى عشرينيات القرن العشرين كانت معظم الصحف تصدر بالأحرف العربية, أما مضامين المجلات و الجرائد فقد كانت اجتماعية و سياسية و لغوية و أدبية و ثقافية متنوعة و لم تكن هناك مجلات متخصصة في مجال واحد في جميع أجزاء كردستان.

لقد ناضل المثقفون الكرد بعناد خلال فترة أربعينيات و خمسينيات القرن العشرين من أجل الحصول على رخصة اصدار مجلة و جريدة من السلطات الحاكمة في الدول المقتسمة لكردستان. حتى سمحت الحكومة العراقية الجديدة بعد ثورة ١٩٥٨ باصدار جريدتين اجتماعيتين سياسيتين هما «آزادي» الحرية لسان حال الحزب الشيوعي العراقي, حيث صدر العدد الأول منها عام ١٩٥٩ في مدينة كركوك. و جريدة «خبات» النضال لسان حال الحزب الديمقراطي الكردستاني و صدر العدد الأول منها في ٤ آذار ١٩٥٩ في بغداد. بعد مرور عامين أغلق الباب أمام الجريدتين.

لكن صحفا كردية كثيرة صدرت في العراق بصورة سرية و بعيدا عن رخصة السلطات طوال نفس الفترة, حيث صدرت تلك الصحف بشكل غير منتظم ولاسيما في مرحلة الهجوم الصارم على الكرد و الشيوعيين .

في سوريا تعتبر مجلة «هاوار» الصرخة التي أصدرها الأمير جلادت بدرخان باللغة الكردية في دمشق في ١٥ أيار ١٩٣٢ بداية الصحافة الكردية في سوريا و غربتها . في ٢٦ تشرين الأول ١٩٣١م حصل الأمير جلادت بدرخان على الموافقة من الحكومة السورية في إصدار مجلته هاوار، وطبع العدد الأول منها في دمشق في ١٥ أيار ١٩٣٢م، وتوقفت مجلة هاوار عن الصدور نهائياً عند العدد ٥٧ في ١٥ آب ١٩٤٣م.خصص الأمير جلادت بدرخان جل مساحة مجلته هاوار لنشر قواعد اللغة الكردية التي قام بوضعها و هندستها و التي تعتبر ثورة كبرى في نقل اللغة الكردية من الشفاهية الى الكتابية و توحيدا للكتابة الكردية في أجزاء واسعة من كردستان, كما ساهم نخبة من خيرة المثقفين الكرد من الرعيل الأول في اثراء المجلة . ثم تبعتها مجلة «روناهي» النور التي أصدرها أيضا الاستاذ الكبير و مهندس اللغة الكردية الأمير جلادت بدرخان و كتب فيها رواد التنوير و اليقظة الكردية أمثال الشاعر الكبير جكرخوين و المناضل أوصمان صبري و الدكتور نور الدين زازا و قدري جان و غيرهم. صدر العدد الأول منها في 1 نيسان 1943 و استمرت حتى آذار 1945 و صدر منها 28 عددا.

أثناء الحرب العالمية الثانية و بعدها دخلت الصحافة الكردية مرحلة جديدة حيث ركزت على القضية الكردية و حفزت على النضال من أجل التحرر و نشرت الوعي القومي بين شرائح واسعة من الشعب كما منحت أهمية فائقة للمواضيع الأدبية على صفحاتها و ركزت على التاريخ و التراث الكرديين.

رغم كل الصعوبات و التحديات التي واجهتها الصحافة الكردية في بدايات ظهورها, الا أن المجلات و الجرائد الكردية عكست بشكل كبير طموحات و آمال الجماهير الكردية و كانت منبرا نضاليا و ثقافيا في آن واحد. ■

# مع الإبداع



علاء الدين حسن

الأمل عند المبدِع نعمة؛ لأنَّه يقوي إرادة النّهوض في الإنسان، والتَّطلُّع للأمام نِعمة تقود الآملين لعالم أفْضل وحرّيّة أوْسع، فمَن أراد هذه الحرّيَّة، فليصنعْ لنفسِه شيئاً يليق بشخصيَّته، وليوقِنْ بأنَّه لا خيار له سوى أن يقوّي كيانه بما يحفظ له احترامَه وتقْديره بيْن النَّاس.

والتَّفكير الإبداعيّ نعمة؛ فبه يسير الإنسان في طريقِه، ويُحدِّد أهدافه بدقَّة، ويتجنَّب أسباب السُّقوط إذا كان تفكيرُه إيجابيّاً، كما أنَّ التَّفكير يولِّد الحماس والنَّشاط، والفاعليَّة، والاستِبْصار.

والتَّخطيط الإبداعيّ نعمة؛ لأنَّه يَجعل الأمم والشُّعوب تسير على هدًى وبصيرة، وتتمكَّن مِن بلوغ أهدافِها بحكمة واعية، ومَن لا أمل له لا أمل فيه، ومَن لا يملك محاولة التَّقدُّم فلن يكون له مكان في عالم الغد، كما أنَّ التَّخطيط يساعد المخطِّط في التَّصدِّي للمشكلات الَّتي تواجِهُه، وترتيب الأولويَّات الَّتي يَحتاج إليْها.

يقول البعض: إنَّ الأمزجة وأنماط الإدراك المقترنة باضطرابات نفسيَّة، يمكنها أن تعزِّز الطَّاقة الإبداعيَّة، وما أودّ قوله هنا تعقيباً على هذا التَّصوُّر هو أنَّ الاكتئاب يؤدِّي إلى الانتحار لا إلى الإبداع، الانتحار الَّذي هو شكل متطرِّف مِن سلوك إيذاء الذَّات يحدث لدى المكتئبين. وقد اعتبر أرسطو – وهو أحد فلاسفة الإغريق– اعتبر الانتحار عملاً موجَّهاً ضدَّ قوانين المجتمع والأعراف الإنسانيَّة، ودعا إلى معاقبة كلّ مَن يقدم على هذا العمل.

وتشير الإحصائيَّات الخاصَّة بمنظَّمة الصِّحَّة العالميَّة لعام ٢٠١٠ إلى أنَّ حوالي مليون إنسان في العالم ينتحرون سنويَّاً، أي ما يعادل حالة واحدة في كلّ أربعين دقيقة.

وإنَّ أهمَّ ما يظهره المقدم على الانتحار هو الاكتئاب واليأس مِن الحياة، والتَّغيّر في نمط النَّوم والطّعام، وإهمال العمل والعلاقات الاجتماعيَّة، والقلق النَّفسيّ والانعزال، والحقد على المجتمع، والتَّخلُّص مِن المقتنيات الشَّخصيَّة الثَّمينة. وكلّ هذه المؤشّرات تستحقّ منَّا كثير الاهتمام، حتَّى نكون سبباً في إدراك الحالة، وإنقاذ الإنسان مِن هذا الخطر.

كما إنَّ المشكلات الأسريَّة، وخاصَّة لدى الأبوين، وحرمان الطِّفل مِن العاطفة والحنان، وتعرُّضه للضَّرب والعنف، وكذلك تعرُّض الشَّباب للاستهزاء والسُّخرية والنَّقد المستمرّ، مِن الأسباب المباشرة الَّتي تؤدِّي إلى التَّفكير في الخلاص مِن الذَّات.

وكذلك إهمال المجتمع لإنسان ما، وضعف الوازع الدِّينيّ مِن أسباب الانتحار، وأيضاً وسائل الإعلام عندما تطرح قصصاً شهيرة لشخصيَّات أقدمت على الانتحار قد تشجِّع المشاهد.

إذن؛ الإبداع لا يساعد على الاكتئاب كما يظنّ البعض؛ لأنَّ المبدع يرى ما لا يراه الآخرون، يرى المألوف بطريقة غير مألوفة، ينظِّم الأفكار ويظهرها في بناء جديد انطلاقاً مِن عناصر موجودة

الإبداع، طاقة مدهشة تعمل على انبعاث ومضة، هو طاقة عقليَّة هائلة، فطريَّة في أساسها، اجتماعية في نمائها، مجتمعية إنسانيَّة في انتمائها.

الإبداع قدرة على حلِّ المشكلات بأساليب جديدة تدهش السَّامع والمشاهد.. حالة عقليَّة بشريَّة تنحو

لإيجاد أفكار أو طرق ووسائل غاية في الجدَّة والتفرُّد . بحيث تشكِّل إضافة حقيقيَّة لمجموع النّتاج الإنسانيّ؛ كما تكون ذات فائدة حقيقيَّة على أرض الواقع إذا كان الموضوع يرتبط بمفهوم تطبيقيّ، أو يشكِّل تعبيراً جديداً وأسلوباً جديداً عن حالة ثقافيَّة أو اجتماعية أو أدبيَّة، أو إذا كان الموضوع فلسفيّاً نقديّاً أو كان يشكِّل تعبيراً ضمن شكل جديد وأسلوب جديد عن العواطف والمشاعر الإنسانيَّة، أو إذا كان الموضوع يتعلَّق بالنّتاج الأدبيّ وأشكاله.

وغالباً ما توصف سنوات الطُّفولة المبكرة بأنَّها العصر الذَّهبيّ للإبداع، ومع نموِّ الإنسان ورحلة النّضج يتحوَّل أغلب البشر لبالغين غير مبدعين، ويفتقدون العديد من جوانب الخيال والابتكار السَّاحرة المرتبطة بالأطفال.

وتحاول العديد مِن الدِّراسات العِلميَّة البحث عن الجانِي الَّذي يقف خلف زعزعة الإبداع، ومنذ العقد الأوَّل مِن القرن العشرين، حاول الاختصاصيُّون في عِلم البيولوجيا العصبيَّة وعلم النَّفس والعلوم الإدراكيَّة فهم العمليّات الذّهنيّة والدّماغية الَّتي تولِّد الأفكار، وثبت أنَّ أهمّ صفات المبدع هي: القدرة على إنتاج أكبر عدد مِن الأفكار المبتكرة بيسر وسهولة، والانفتاح على البيئة، والقدرة على رؤية المشكلات ووضع الحلّ المناسب لها، والثِّقة بالنَّفس والبعد عن الحلول التَّقليديَّة.

والمبدع لا يحبُّ الرُّوتين.. لا يخشى الفشل. (أديسون جرَّب1800 تجربة قبل أن يخترع المصباح الكهربائيّ).

وقد حدَّد /ماسلو/، حدَّد خمس عشرة صفة للأفراد الَّذين استطاعوا تحقيق ذواتهم, وشملت هذه الصِّفات: قبول الذَّات، العفويَّة، الاستقلال، التَّسامح، الإيثار، الأخلاق، القدرة على حبِّ الآخرين, والتَّواضع والتَّمتُّع بحسٍّ فكاهيّ.

وبعد: الإبداع كفاءة، وطاقة، واستعداد يكتسبه المرء عبر تركيز منظَّم لقدراته العقليَّة وإرادته وخياله وتجاربه ومعلوماته.. الإبداع سرٌّ مِن أسرار التَّفوّق في ميادين الحياة، ويمكِّن صاحبه مِن كشف سبل جديدة في تغيير العالم الَّذي يحيط به، والفكاك مِن قيود الرَّتابة والنَّمطيَّة.

الإبداع مفهوم عميق للعمل الجادّ والتَّفاني فيه، فالانهماك في العمل والتَّنسيق بين أفكار عاديَّة بأسلوب مبتكر يثمر إبداعاً غير مسبوق، وكلّ إنسان يمكن أن يكون مبدعاً أو فنَّاناً بأفكاره البسيطة والعاديَّة، بصقل بعض المهارات، وتعلُّم الأشياء بطريقة جيدة وفعالة.

الإبداع لا يرتبط بأيّ شيء سوى الأفكار وكسر حواجز الإطار التَّقليديّ للحياة، وهو ضروريّ لحياة الفرد لكسر الرُّوتين والملل، ولتطوير مهاراته ومعارفه، ولإثراء حياته بالتَّجارب والمواقف الجميلة، وله أيضاً دوره المهمّ في جعل المبدعين بصحّة نفسيّة رائعة، ويسهم في تنمية الصِّفات القياديَّة.

الحسكة



# الواقع الاغاثي في مناطق الادارة الذاتية



تقرير: مجلة ولات

مع استمرار الأزمة السورية و عجز المجتمع الدولي عن ايجاد حل لها و عدم توفر ارادة حقيقية لانهاء معاناة ملايين السوريين , و مع احتدام الصراع بين القوى المختلفة المتدخلة في الشأن السوري و تعارض مصالحها , تزداد المأساة الانسانية على كامل الجغرافيا السورية يوما بعد آخر و يتجه الوضع في الداخل السوري من سيء الى أسوأ حيث بات أكثر من ٨٠٪ من الشعب السوري يعيش تحت خط الفقر بحسب الكثير من التقارير الأممية, ناهيك عن المآسي التي خلفتها حرب العشر سنوات و ماتزال المأساة في تفاقم مستمر.

الوضع في مناطق شمال و شرق سوريا الخاضعة للادارة الذاتية لا يختلف كثيرا عن المناطق السورية الأخرى و ان اختلف شكل المأساة, فهذه المناطق التي تم تحرير معظمها من سيطرة تنظيم تنظيم داعش تعاني العديد من الأزمات, منها ما هو معيشي و منها ما هو أمني و سياسي.

بالنسبة للوضع المعيشي فأن غلاء أسعار السلع الأساسية كالخبز و المواد الغذائية و الغاز و المحروقات اضافة الى عدم توفر بعضها و فقدان بعضها الآخر بشكل كامل بين الفينة و الأخرى انعكس بصورة كبيرة على الوضع المعيشي لسكان المنطقة و رفع نسبة الفقر فيها في ظل تقاعس الادارة عن ايجاد حلول جذرية لهذه المشاكل, و الذي يلعب الفساد المستشري في بعض مؤسسات الادارة

مـع غيـاب الخطـط الاسـتراتيجية لمعاجلـة هـذه الأزمـات اضافـة الى غيـاب شـبه كامـل لـدور المنظـمات الدوليـة في الجانـب الاغـاثي , كل ذلـك لعـب دورا كبـيرا في ظهـور مثـل هـذه الأزمـات و تفاقمهـا.

كـما أدى الهجـوم الـتركي عـلى مناطـق عفريـن و رأس العـين و تـل أبيـض و احتلالهـا لهـذه المناطـق الى نـزوح مئـات الآلاف مـن سـكان تلـك المناطـق باتجـاه مناطـق الادارة الذاتيـة مـما شـكل ضغطـا سـكانيا كبـيرا عـلى مناطـق الادارة الذاتيـة و بخاصـة المـدن التـي تـم النـزوح اليهـا , موجـة النـزوح الكبـيرة هـذه حملـت الادارة أعبـاء مضاعفـة تفـوق قدراتهـا, لاسـيما أن المنظـمات الدوليـة تملصـت مـن أداء أي دور لمسـاعدة هـذا الكـم الهائـل مـن النازحـين و الـذي يقيـم الآلاف منهـم في مخيـمات النـزوح ضمـن شروط قاسـية.

كـما أدى اغـلاق المعابـر الاغاثيـة المؤديـة لمناطـق الادارة الذاتيـة الى حرمـان سـكان هـذه المناطـق و الذيـن يقـدر تعدادهـم ب ٥ مليـون نسـمة مـن الاسـتفادة مـن الاغاثـة الانسـانية التـي تقدمهـا الـدول و المنظـمات, في حـين أن هـذه المعابـر مفتوحـة عـلى مناطـق سـيطرة النظـام و مناطـق الاحتـلال الـتركي.

مضافـا الى كل ذلـك فـأن تحكـم الاحتـلال الـتركي بميـاه محطـة علـوك التـي تـزود حـوالي مليـون نسـمة بالمـاء و قطـع هـذه الميـاه بـين الفينـة و الأخـرى مسـتخدمة ذلـك كسـلاح سـياسي ضـد هـذه المناطـق بمـا يتعـارض مـع القانـون الانسـاني. اضافـة الى تحكمهـا بمنسـوب ميـاه نهـر الفـرات و قطعهـا و هـذا مـا يـؤدي الى حرمـان السـكان مـن الكهربـاء تـؤدي الى ظهـور أزمـات انسـانية كبـيرة تزيـد مـن معانـاة السـكان.

كل ذلـك اضافـة الى حالـة عـدم الاسـتقرار الناجمـة عـن الهجـمات المتواصلـة مـن قبـل تنظيـم داعـش أو الفصائـل الموالـية لتركيـا عـلى مناطـق الادارة الذاتيـة أثـر بشـكل كبـير عـلى الوضـع المعيـشي و الخدمـي في هـذه المناطـق.

أمـا المنظـمات العاملـة في مناطـق الادارة الذاتيـة و رغـم كثرتهـا فـأن عملهـا تركـز في السـنوات الأخـيرة في مخيـم الهـول الـذي تقيـم فيـه عوائـل تنظيـم داعـش و في بعـض مخيـمات النازحـين الأخـرى أو في اقامـة بعـض المشـاريع الخدميـة في المناطـق المحـررة مـن داعـش كمدينـة الرقـة. بينـما لم نشـهد لهـا أي دور يذكـر في الأزمـة الاقتصاديـة و المعيشـية الخانقـة التـي تعـاني منهـا فئـات واسـعة مـن سـكان المنطقـة.





Dîlan şewqî

# DEMA TU TÊ BÎRA MIN



Dema tu tê bîra min , bihna Zenbeqê  tê
Ez wek Perîkê sivik im.
Ez  di hundur de hilnayêm.
Xulqê min ne li mirova dimîne.
Ne li kûçikê mey Reş  yê çav sitêrk,
Ko ez her roj nan didêmê.
Dema tu tê bîra min,
Hilma min wek hespekî westiyayî
Bi zorê diçe û tê.
Ez dikelim.
Diperpitim
Wek lempake xirabe
Vêdikevim
Vedimrim
Ez çavên te li dû sitranan dibînim
Gula ko tu jê hez dikî, hilma wê tê min
Hewşa cîrana ya tije dar,  ez lê nanerim.
Gava tu tê bîra min
Çi îşkence ye
Ta kevçikê dil te divê,  gava tu tê bîra min. ■

# لست شاعرة

عبير عبدالرحمن دريعي



ثمة نداء عميق أشعر به يناديني، نداء كأنه من زمن بعيد، أو ربما من أزمان سحيقة مضت، إنه نداء الشعر يراوغني، يغريني.

يرتديني روح شاعرة

و أمضي في المغامرة، فالكتابة مغامرة كبرى،

و الحروف مذ كنت صغيرة كانت تسحرني فأرسمها و ألونها،

و أجعل لها أعين

وجوها و ألسنة

و أفواه فاغرة ، كانت الكلمات تدخل غرفتي.. تتسلل إلى مخدعي

و ترتدي ثيابي... تزحف نحو بياض أوراقي و ترقص في أفق خيالي كالجنيات..

لم أكن شاعرة، و لا أعلن نفسي شاعرة، لكنها روحي تبوح بالكلمات.. تمضي وراء البوح.. تركض خلف الفراشات، أرسمها من جديد كلمات تمارس الرقص

و الصراخ، تركض، تبحث، تلهث، تتألم،



اللوحة: الفنانة التشكيلية سمر دريعي

و تسافر في مسامي إلى تخوم الفجيعة

و الذكريات.. فتأكل من روحي و من أصابعي... فأصرخ من الوجع.. أتساءل..؟!. هل الشعر لعنة..

هل هو عشق... أم أن العشق هو لعنة أزلية..؟!.

أو قبض على الجمر.. أو إنه طريقة صوفية أضيع في ابتهالاتها

و رائحة البخور..

و أمضي في دروب ترابية يأخذني الشعر من يدي كطفلة.. يأخذني إلى الحقول..

إلى تخوم البرية

و العشب الندي

الشعر هناك ينتظرني..كالوقت

مصيدة فولاذها رمادي بارد يشد على لحمي

و أعصابي، يحطم عظمي .. يأكل جسدي

و أنزف طويلا..

أصرخ من جديد..

ليتني لم اقرأ الشعر

ليتني لم أكتبه

ليتني لم أولد

ليتني

لست شاعرة...

توزع مجـــــــــاناً

Şêwekara Kurd XUNAV SALIH:

« “Ez dixwazim bandora şer û mirinê li wî mirovê wêranbûyî bidim xuyakirin, bi hêviya ku rojekê roniyeke mezin di tabloyên min de xuya bike”



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Welat
ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة
العدد (٨٠) ٢٠٢١/٤/١ م